# Diyarî

**Diyarî gelê Kurd û Kurdistanê dikim**
**Diyarî Xwendevan û Honermenda dikim**
**Diyarî Satalaytên kurdî dikim**
**Diyarî canê Bavê Xwe dikim**
**Diyarî dayîk û jina xwe dikim**

**Helbestvan :Zikrya Elî**

## Sûlav

Di ser zinar û çîm re em dimeşîn
Dest di dest yarê de çav li me barîn
Li siya takî kelmê em rawestîn
Yek ji me bû agir yek jî bû benzîn
Li dû hêviya çarde salan me hev dît
Bû kit kita dil û cîger li nav çît
Em bê hiş man çih ji raman çih fedî
Ez kirim xezal wê geyîka kedî
Ji pelê Kelmê pirs bikin gih çih dî
ê bêje: dîno îro yara xwe dî
û çavê dîdinê hev pîroz dikin
û xweş beryê Buhiştê kerem dikin
Me şîrav ji lêv û devê hev dimêt
Nişkava got: bese her tişt bi qinêt
Te avik da êrşikêd min tev te mam
Tirsa min sewda te min bikê dotmam
Zû çû ava dema li ber sûlav
Bi rastî mirov dimre dimîne nav
Paşê jimin bidûrket hîdî diçû
Wek meşa wê jî canê min dida dû

## Bîriya te kiriye

Ez û mistik avî zelal em bîrê pîç û destê te dikin
çav û biryêd min va bîrê Xeml û xêzê bejnê te dikin
Ev lêv û diran û zimanê me va çiqas bîrêd hev dikin
were em dûriyê bi kujin parêd xwe yên girtî ava kin
Dest û mistê min va çiqas bîrê rû û porê te kiriye
Guhê min bi pelkê xwe va bîra dengê te yê xweş kiriye
Xem û xeyalêd min pir bîra awirên çavê te kiriye
wer em hev jîndarî kin; jiyan di dûrîyê da tineye
Poz û bêvlêd xwe va pir bîra bêhna xurmanê te kirine
Xewin û cîxewa min bîra agirê sîngê te kirine
Û çiqas helbestên min bîrê gilgazênciyên te kirine
Dê were em canê xwe zocanî kin dûriyê îman reşe

## Ew rindî bi xwe

çi bi dil ket can kir qêrî
Bi şev û roj tim digerî
Li evîna wê çav reşê
Wê dîm topê sîng zebeşê
Bûye gulik di xûnêde
Hezkirna wê ji xwedêde
Piştî av bi cîhan keve
Yan berî ezman bişeve
Min bîhst carek li helebe
Lêdigerim xiyan nabe
Dû Du hezar buhar borî
Yara xwe min li înê dî
Ji min nêzîk bû dil ket mist
çav mêzekir agir pê xist
Gulik li lêv gurzik di dest
Hêvya xwe min ji xwedê xwest
Min jê dizî ramusanik
Ewê ji min bir dil û kurçik
Hêdî hêdî ji min  dûr ket
Dûr kûr nirî can bi pê ket
çavan di hev de mêzekir
Helbesta lê avcenîkir
Zanî can gihşt mirazê xwe
çi bêjim ew rindî bi xwe

**Em ê hevin**

Dîlber hat ba min dem buhare
Serma çû tîrêjî di bare
Zozan alîk gule Yek dile
Li ser çiyaya berf dihele
Yar xulmaş bû li ser sîngê min
Geykê xwe berdan nav çîmê min
Got: ji behna te ez têr nabim
Lê bi canê te re tîj dibim
Bi wê gotinê ez giş borîm
Li dor cîhanê tev de gerîm
Min got: Bese ez gî hunda bûm
Nav awirên te da bela bûm
Got: Tu dermanê nav dilaye
Ne bes Bulbulê ser gulaye
Bi vê lêvên xwe min derman ke
Weke lêymûnê min guvêj ke
Em bibin tuxturê canê hev
Em hev saxikin bi roj û şev
Nişka va em bûn kokirê hev
Me ji hev dixwar bi lêv ji dev

## Ezî tîme

**Ezî tîme nebejî me**
**Ji lêvên te bi hêvî me**
**Meyê hûne bi min gîne**
**Kul û xema bi kewîne**
**Ez birçîme destdirûme**
**Xurmang sêve enî berfe**
**Sîng zozane çav mircane**
**Nav diranêm xurme xurme**
**Li cîhanê bi tenê me**
**Bi hezara jî lê hene**
**Çax diçin xew hev di bînin**
**Birînên dil di kewûnin**
**Ez dîlberê te dînê me**
**Ne sêwiyê evînê me**
**çiqas gune li min kirin**
**Li dawiyê çav kil kirin**
**Bi min rago: Tu yarê min**
**Wer baxşîne gunehêd min**
**Evîna wê bû doza xweş**
**Bi xwe hêva ezmanê reş**

## Destgirtiya narîn

Ey destgirtiya narîn
Bi şev wer min bi revîn
Te ez kirim har û dîn
Avêtim derya evîn
Zêrê te li tilya min
Li paytextê dilê min
Dil ketiye zîndanê
Maye hêvya dîlanê
Keç û xort jî delalin
Li vê dozê dinalin
şev û roja dijmêrin
Kînga ew hev bibînin
Li nek canê hev rûnin
Agirê xwe vêxînin
Hemî miraz di dil da
Xwedê pîrozkê ser da
Emê durbê bikujin
Di nav xwe da bibrêjin
Bes wer ba min ava jîn
Bi hevdin lêvêd şêrîn
Destikî têk mistê min
Ê din deyn ser milê min
Bêje; Tu yarîkê min
Kulê birevin ji min
Ger hatim te dil birîn
Xwe di min da bi borîn
û ger hatim te bi dîn
Xwe gî li min bi palîn

## Jina min

Jina min tuyî delava jînek tijî evîn
Tu ji tîpên jînê çêboyî şorik nayê dîn
Me nav navika hev dibirî bi çîçek hinguv
Tu bo buhara geş ez li ser dikim guve guv
Tu mala minî xanî bê te zîndane yan çol
Evîna min tavek dîn bû te xwe jêra kir gol
Ewrek tijî av bom tu axek ziya û tîbo
Dema em gihêştin hev xweş buhar bi me çêbo
Ji me pêda bûn gul û çîçek hin zo û hin tek
Perweriya xwe jîr bik kesî ji van nek virek
Bila evîn mezin bibe wek evan bi roj û şev
Em ê bibin wek du par bi hev û ez lêv û tu dev

## Ne bêje

**Nebêje bi min re: çime ji te re**
**Bê tu ewrek ji baxçê minî tî re**
**Ezê istêrka bi av kim ji te re**
**Dil arkim bi kil kim ji çavê te re**
**Bes tu ne bêje: Ez çi me ji te re**
**Bê: Tu sîwarê xewna minî zêrî**
**Canê bêje: Di xew de min tu birî**
**û navê te bi xwe re nivîsandî**
**Ne bêje bi min re: Em herdu gidî**
**Bêje min: li min biyne çend hunere**
**Jîna xwe dikim gurz ji destê te re**
**Min dilê xwe kirî sifre ji te re**
**Ma hîn tu dibêjî: çime ji te re**
**Buhar giş li hêviya min buhirî**
**Ji bo tu gula min qeh nekir qêrî**
**Lê ji te ra bû wek kevokik kedî**
**De bêje: Me canê xwe di hevde dî**

## Zocan

Zocan zozana dile
Dil di nav da bulbule
Zocan yarek delale
Honav ji ber dinale
Bejna xwe pir xweşike
Ne mezine çuçike
Por çîl mîna tîrêje
Wek bejna wê dirêje
çav sipî nêvî zere
Tev bi riya cewhere
Lêv perî gula sore
Rûkenî jê ne dûre
Awir wek şaxên sibê
Canî pê şiyar dibê
Xwedê bi xwe çêkirî
Kî vêra diçe serî

## Ez û can

Ey agir reşê canê min
Xûya nabê li nav dijmin
Evîndara dike dîlber
Ez giş helandim ber ji ber
Evîn bi xwe rengê neyar
Mame ji hestî û eyar
De ji min veger law dilo
Dem payîze tijî çilo
Ev jî ne ji nifşa Hewa !?
Nêçîra digre bi gewa
Tirî û qoriq giş duxe
û hîn li bêgcî jî dixe
Wek min niha bi we re got
Can vegerî pirsa xwe got;
Lê hûn jî mêrin ser bilind
Wek şêr çav bi çîk welo rind
Jê yê dil tenik mîna kund
Yara xwe dixê li nav gund
Wek tîrêj gula vedike

Xweşik cana rûgeş dike
şiyar kirim vê çelengê
Bes mêzeke lêv û çengê
Dîsa loma ji min bike
Ya xwe ji min perçe bike

## Zarok

Rojikê bi rêda diçom
Min dît lawê min li nav kom
Hin Ereb û Faris û Rom
Min pirsa xwe lê kir bi lom
Go: Em zarokin çûçikin
Ji cîhana xwe hez dikin
Rewşmendiyê qet nizanin
Em hemo zaro birayin
Ew vegerî lîska xwe kir
Ez rûniştim min lê sekir
Hew wek avek zelal dizîn
Hin dibon mem hin dibon zîn
çi bi tûjî wan digirt hev
Demeka din diçûn cem hev
Dengên zirav awazên xweş
şevên tarî dikir roxweş
Min berv da jor xwezya xwe xwest
Xwedê tu şîrê me bike mast

Lê heya heye mar tufan
ê her hebê şerê bavan
ji bo va zarokên rû geş
Qeh nebînin şevên pir reş
Bila xebat bibe Du qat
Qeda kurda bikin felat

## Cigare

Can ji min pirs kir wek yarê :
Xêr tu dikşîne cigar.
Rast dalxê me re datînê
Lê derda bi me re dixînê
Kezebê sipî reş dike
Zehletanê nêzîk dike
Rûyê zelal zerreş dike
Jîna buhişt êtûn dike
û ger ew biçe piş perdê
Dem cigarek ber xwe nadê
Hîza kevroşk dike masî
Şêrê çîya dike pisî
Nîv sêfîlbûn ji pişt wî ye
Dizekî pir jêhatî ye
Nan tinebe ne ti xeme
Lê ger tutûnbe pir şer me

**Loma sond dixum wek mêra**
**Gi venexim ti cigara**
**Va sonda jî pir biha ye**
**û wek hêva li panzda ye**

## Dest pêka min

**Ezim Zekeriyê Eliyê miraza**
**Ne ez nanikê dixim bi heft pîvaza**
**Ji evînê çêdikim helbest û saza**
**Baş ji hev cihê dikim zana û zaza**
**şora Yekê min got: Ax eya din dayê**
**Loma Kurdistan ji dilê min der na yê**
**Em di lîstin li nav gund û ser bêderê**
**Westî bi me diwestî ma ê vegerê**
**Sê sal min derbazkir ji şagirtiya xwe**
**Di nav dibistana gundê Alkana xwe**
**Qata yekemînê min dibir ji gişa**
**Ez bûm şorek li ser zimanê rûgeşa**
**Sê sal din jî min guhartin li Efrînê**
**Bi jîr gerîm li zanebûn û xwendinê**

Gi min çi pirs dikir delavik ve dibû
Dîsa jî mamuste pir ji min şa dibû
ûsê sala jî min xwend qorên navînî
Di debistana Aştîvana giş ronî
Jîn û mirin û muf û remanên teze
Loma bêhna azadiyê ji min dize
Sê yê din min kir xwendina kar kiriye
Her tişt min bi mêzek bengehî wê biriye
Edîson çawa gerî em biçin li rê
Digera cîhanê li ser vê digerê
Sê sala jî ez bûm mamustê şagirta
Min bi hêz ketxar derdixistin ji korta
Pêşroja me min di çavên wan da didî
Ji ber vê hemo dibon zane û gidî

## Dil dikolê

Te xwe ji min bi dûrkirî
çira te canê min birî
Te tim bi bîrê min tînê
Reng bi reng dil di şewtînê
Bi roj geh bulbul dixûnê
Ji wî diçe çema xûnê
Min got : şahya min li şevê
Canê çîçkê jê dûr kevê
Ne zanim ew li ser hêvê
Ronyê didê ji wê lêvê
Ahîn ji can dike qêrî
Çîçkî din ê bidêgirî
Ew tîje mîna hejîrê
Şêrînya wê kî hilgirê
çavên xwe êstiryê gulê
Tîr bi tîr têr dil dikolê

**Ramusanek ji wê rindê**
**Di nav berfê da xuhdidê**
**Ew Sipiye mîna pembû**
**Ez kuştim û got ; Tişt ne bû!**
**istêrk li hember te rijî**
**Ma hîn tu dibî her bijî**
**Dê zû wer tu hemo mijî**
**Dibe me ra bi rast bijî**

## Mêr û Jin

**Tu jina min   tu jîna min**
**Tu ye mala    xeyalê min**
**Pir şiyare      azadiye**
**Dest girtî me   serbestiye**
**Tu mêrê min  tu mîrê min**
**Tu xwediyê   jiyana min**
**Pir çelengim       ciwaniye**
**Pîr bim bi te       buhar tiye**
**Hemo evîn       a dilê min**
**Te kir şoreş      a çavê min**
**Wek şilêra       li nav berfê**
**Ez helandim      bi wê lêvê**

Hemî gulêd li baxêd min
Bo agir ê nav canê min
Tu baran a li pê bê tê
Bi dengê min ava te tê
Ji hemû tişt ji min guvişt
Cîhan li min boye buhişt
Berî pê hat ew bo welat
Zaroyên me bike polat
Parik ji tişt hêza xwe pişt
Niwalê min kir xişt û mişt
Ger xazî qat ew Rojhilat
Reş û tarî dike şewat

## Bila

Bila tu li nek min be zocan
Jîna min bo te bi be qorban
Destê te di mistê min de bin
Em herdu di çavên hev de bin
Momika evînê vemrînin
Sewdak nuh li ezmên vêxînin
Bila kes destê xwe nave wê
Fedî yê şîyar be ji xewê
Yek car bêje ; Ji te hezdikim
Eya din ezê vêra bihelim
û nekanim demê pêşdakim
Gi te li mil û piştê xwe kim

**Dibêjim şorek nakim barek**
**Li ezmanê min tu istêrek**
**Jînek neboyî pêdakim**
**Li delava jînê xiyakim**
**Paş perdê bi mêşa hinguv bim**
**Ji her çîçekên te bimijim**
**Berê Sewda xwe em biçînin**
**û berê evînê biçinin**

## şagirt

**Em şagitên Debistan**
**Em çûkên li Gulistan**
**Bi hevra bi yek destan**
**Rakin ala kurdistan**
**Pêşaroja gel emin**
**çavê Wan li rêya min**
**Ger doza min pir dijwar**
**ê sivek bi be bikar**
**Va mumistayên delal**
**Remanan dikin zelal**

**Ji me re wekê Bavin**
**Em darin ewna Avin**
**Ji her der tên vê Xanî**
**Sîvîl û Malbatxanî**
**Em giş li vir dicivin**
**Xweşk û Birayên hevin**
**Jivê cîhî hezdikim**
**Loma ez gemar nakim**
**Bi kesîra nagrim hev**
**Lêv perçe nabe ji dev**
**Em şagirtin xweşikin**
**Jîr û Zanayên çûkin**
**Emin roja nuh Jiyan**
**Tîrêjê didin Cîhan**

## Yar û welat

**Di awirên çavê yara xwe da**
**Mirûrê welatê xwe dibînim**
**Di saz awazên gavê yarê da**
**Merşa pêşmergê kurdî dibîsim**
**Di germbona destê cana xwe da**
**Agirê Newrozê têr tehn dibim**
**Di behna rû gula dîlberê da**
**Hilma axa bi xûn ta bîn dikim**

**Di mêtina lêvên yara xwe da**
**Tehlya butrola wetat tehm dikim**
**Di mistdana memikê Rindê da**
**Wanê û Ormiya bi bîrtînim**
**Di girî û şahya delalê da**
**Xem civîna hemo gel dihesim**
**Di ahûahîna Jîna xwe da**
**Hawara girtiyên Kurd dibîsim**
**Lê di zocana dilê Kurda da**
**Bihna azadiyek xweş bîn dikim**
**û di buhişta sîngê Yarê da**
**Kurdistana biçûk ava dikim**

## Helibçe

**Ma  çawa emê ji bîr bikin qurbaniyên helibce**
**û di axa wêda hişîn nake ne genim û ne ce**
**Kî kanê çûkên wê û gul çîçeka lê vegerîne**
**Kî kanê dayêk û bavên zarokên wê jêra hûne**
**Ew xerdela ji rengê Buhar wan çiqas xweşik dixar**
**Bi balefira lê reşandin ew bû dûman û neyar**
**Ev çiqas erd û ezman û roj û stêrk dûrin ji hev**

Hemo bûn agir û tarî û li serê wê hatin hev
Giş çav lê kûrbûn  kab lê şikiyan hin tiştî  tê xiyan
Bi çiya ketin ew û dengê wan bela bûn li cîhan
Li hemo Kurd bûye êş û birîn û çev û girî
Gi hezar sal biçên bîrhanîna wê dil dike çirî
Rast Helibçe bû êş û nîşana bindestiya Kurdan
Lê gel bi hêz şiyar bûn dest ji xebatê qet bernedan
çek û tehlî dest xwe kirin rabûn serhildana Gulan
îro Seddam ketxarî û wek serbixwe ye Kurdistan

**Kerkok**

kî dîn dibêje : Darê berî bide bê ax û kok
Ew bê hiş dibêjin : Kurdê bijîn bê axa Kerkok
Pir zor û êş lêkirin gi Kurda lê dûrbe bikin
Her tişt çû bes kurdê wê lê ma bila werin sekin
Hinjî hene li xûna dilê me dikin çav tengî

**Mirov gêştin ser hêvê hîn ew kes mane bi vê rengî**
**Zanin Sedêm çi lêkir û li dawiyê çawa çû**
**Hîn di doza wî da diçên dixwezin xwe bidin dû !**
**Qudsa rind ji bîrkirin dû Kerkoka me dikevin**
**Mîna kûçkên har li ser gurekî bi hev dikevin**
**Demê gur berv dide çiya hemû dibin wek miya**
**Zanin li wir şêrek heye dixê goştî hemiya**
**Tirsa wî ji kesî niye lê xwe tev nadê gura**
**û ger ceng bibe berê hemû şêr û gur wek bira**
**Gur ji gişye hişk tire lê bi hîza xwe nizane**
**Ger bibe zaze ji hemiya ra ê bibe tane**

**Koça Kurda**

**Gir rojhilat bi rojava be**
**Birbankek xweşê Jê peydabe**
**Tarî istêrka xiyan dike**
**û tehlî hungiv şêRîn dike**
**Gi kê ev birîn bi me xistin**

Şêr û piling li rêz rêxistin
Ev dîn û dîn bi hev xistin
Lê em rakirin xwe dê xistin
çend xûnxarin pir har û nezan
Dijmin ê Kurda rêdanên wan
Hemo şivanê pez û gavan
Ma ew karin dakevin dîlan
Kurd jî ji bav pîrê îbrahîm
Miletê dil sipî rû ji çîm
Lê ev roj ku Elîf dibe mîm
Ma çawa ê nas bibin bi dîm
Dîrok dîsa lê hatye giran
Wek îsmehîl we xwe kir qorban
Ji bo gelê Kurd û Kurdistan
Lê kesî jî nîna ew raman
Huşyarbin ji tarî û tûjî
Hemo dil şah rû geş yek bijî
Cejna me ji çira gewirîn
Ma ne bese em dikin qêrîn
Kurd hemo şêrin çi mêr çi jin
Zaneyên serî tijî hişin
Ji bo kurdistanê xûnrêjin
Li xwe man çi bi hev ra bêjin
Me ji vê axê gelek hezkir
De têda bihelin wek şekir
Cejna bavê Luqman pîroz kin
û gurzik gul jî li hemya kin
Ey bira Samî Ebdilrihman
Hûn hemû xweşin tev şêx Yazdan
Bi we Hewlêr bû koça Kurdan
De bi hev ra şênkin Kurdistan

**Berzanî**

Bi rastî mirov carek tenê ji diya xwe dibe
Lê bi rastî jî mirovek her dem jîndarî dibe

**Di dilê gelê Kurd û çiyayên Kurdistanê de**
**Di ramanên xebatkarên başûr û bakorê de**
**Di hatina buharê da yan di behna gula de**
**Di helbestên dosta da yan di nifirên dijmin de**
**Di diziya avê da yan di hişkbûna zinêr de**
**Di bûndinê lawa da yan di awirên şêra de**
**Ne bi xwe jîn dibe di her der û demê Kurda de**
**Bi karê xwe jîn dibe di hemû Kurdistanê de**
**Cîhanê Kurd bi te nas kirin û heya niha jî**
**Gi kê got : Ez Berzanî me vêra dibêjin : Bijî**
**Ji berî ji dayka xwe bibe vêra ket zîndanê**
**Tirs û tarî têda vemirî û daket dîlanê**
**Şoreşgerekî çav biçîk serî xwe tijî raman**
**Loma tu bû rêberê hemo miletê Kurdistan**
**Ji te pêda bûn şêr û piling mîna gul û reyhan**
**Luqman Idrîs serok Meshûd çi xweşberî Nêcîrvan**
**Doza xebatê girtin xwedyê Kurda li milê wan**
**Ranazin heya felat û azad nebe Kurdistan**

Kurdên Bakor

Kurdên bakorê hele bêjen hûn kî nin
Hûn xwe zanin ? Ma çira hûn ne bi kînin
çi ser bilindîke pelên dîroka we
Lê waqasa jî şerme ev demroja we
çi ye ev li Yek Du bajara radibin
û bi Bîhst bajara jî dimînin libin
Ger hin ji kurdên jêhatî xebat di kin
Lê hemo Tenbelên din jî mêze dikin
Ma mîr Mihemed ne ji bav pîrê weye ?
Û şêx Sehîd û seyêd Rêza ? wenaye
Kanî çêlkên şêra û kurên Bedirxan
Hûn Berazên gelan xwe mekin nav Berxan
Ka xwenedan û xwendevanên Bedlîsê
Gi çiqas bi çêkbin Yek û Du dibin Sê
Ka ew Tepsî û Kevçî û Kêrên zêrî
Bi biratî te nêrî ew ker bo zirî
Nihajî bawar kin va Tutûnî Mûşê
Kî diçînê û dipêçê û difroşê
Di dandin istandina cîhanêyî tev
Dibe hûn karzirarê xwe derxin ji hev
û bi hemo Pîç destê xwe bavên xebat
ê pir zû pêkwere azadiya welat
Amed ê rast bibe peytexta kurdistan
û yar ê soza bi hevdin li nav Gulistan

## Bese

Bi Arî em hatin guhartin
û bi Biraytî hat veşartin
Bi îslamî jî hat helandin
Bi Dîmuqratî tê xopandin
Ev dema roja me kurdaye
Birakujî li nav nemaye
Dijmin î hîro ji derva tê
Yekbona kurd wêran bi wan tê
Cîhan li rêjîm bûy kuratî
Wî bi yektiya êraq girtî !
çawa iskenderon ji bîr kir
û hîn colan tev xwe nekir
çira zaroyên xwe difroşin ?
Ma ewna karin me bikirin ! ?
Berê Erebistan firotin
Wan çi kar ji pişt wayê Kirin
Heyşt sala ceng bi hevra kirin
Rengê nebûyî bi hev kirin
Codên çekan li hev teqandin
Bi Sedhezar laşe kuşandin
Ev cêhî milet birçî dibû
Û sin û şêhî rûbeş dibû

Paşê gi cenga wan sikinî
îslamkujî xwe bi pêkhanî

## Gotin kurd

Ew herdem dibêjin ; Em ji wî hezdikin
Lê ger perçe bi be emê Wî gezbikin
Dibêjin ; Gir xwe bike fîdraliyet
Emê bi hevra biçin dijî ew dewlet
Yek dibêje ; Eva li ba min rêzek sor
Ezê Wê welatî ji wan ra bikim gor
Yê din got ; Ezê wê welatî bikim xûn
Û emê li şûnê bixon hinguv û rûn
Ê din got ; kurdê Rojhilat biçelqînin
Dibêtke em wan bi hevdi bişewtşnin
Yê din jî got ; Ezê wayî bicelqînim
Di nav dîmuqratiyêda bipelxînim
Paşê jê Kuştin û bi mirira meşîn !
şerm û fedî ji me û wana diweşîn
Gotin ; kurd sûcline û yê ji me dînin
Lê dibe em birîndara bikewûnin !